# PÊŞNÎYARÊN LAHEYÊ
# Dİ HEQÊ MAFÊN PERWERDEYÎ YÊN HÛRGELÊN NETEWÎ DE Û NÎŞEYÊN AGAHDARÎYÊ

## PÊŞGOTİN

Rêxistina Parastin û Hevkarîyê li Ewrûpa (RPHE) di biryarên xwe yên Helsînkî ya Tîrmeha sala 1992 de nîşan da ku, rola Komîserîya Bilind ya Hûrgelên Netewî bibe haletek ku bikaribe di demeke herî zûtirîn de pêşî li dijayetîyan bigre. Ev biryara hanê, bi taybetî ji ber tesîra rewşa Yugoslavyaya berê bû, ku tirs hebû li cîyên dinê yê Ewrûpê jî tiştên hanê dubare bibin, bi taybetî li wan welatên ku teze derbazî demokrasîyê dibin, û zirarê bidine doza aşitî û serfirazîyê ku Serokên Dewlet û Hukumetan ji bo Ewrûpayeke Nû dabûne pêşîya xwe di Çirîya Paşîn a sala 1990 di Senedê Parîsê de.

Di Çileyê Paşîn sala 1993 de birêz Max van der Stoel cara pêşîn wek Komîserê Bilind ê Hûrgelên Netewî (KBHN) yê RPHE dest bi karê xwe kir. Birêz van der Stoel, di saya tecrubeya xwe ya mezin wek Endamê Berê yê Parlamenê, Wezîrê Derva yê Hollandê, Nûnerê Daîmî yê Hollandê li Milletên Yekbûyî û parêzgerekî mafên mirovî bi salan, bala xwe da ser gelek dijayetîyên di navbera hûrgelan û hukumetên merkezî de li Ewrûpa, ku gor raya wî, dikaribûn germ bin. KBHN, bi karanîna rê olaxên dîplomatîk, bi karên dehan welatan mijûl bû, ku di nav wan de Albanîya, Xirwatîstan, Estonya, Macarîstan, Kazakîstan, Kirgizîstan, Latvîya, Makedonya ya Komara Yugoslavya ya Berê, Romanya, Slovakîya û Ukrayîna jî hebûn. Xebata wî berê li ser rewşên hûrgelên etnîk yên han kom bû ku, endamên wan di nava dewletekê de piranî, di nava yê dinê de hindikahî bûn û bona vê yekê, bala hukumetên herdu dewletan jî dikişandin ser xwe û ger nebin sedemê şer û pevçûnan jî, di navbera wan de dijayetîyek peyda dikirin. Bi rastî jî, pirî caran dijayetîyên hanê şikil dane dîroka Ewrûpê.

Helwesta KBHN li himber dijayetîyên hûrgelên netewî, helwesteke serbixwe, bêteref û hevkar e. Ji ber ku KBHN ne dezgeyeke teftîşî ye, ew gor standardên navnetewî kar dike ku her dewletekê bî çarçuveya wê û şîretên wê re razî bûye. Bi vê wesîlê, gelek mihîm e ku em bînîn bîra xwe, berpirsîyarîyên ku wan dewletên endamê RPHE girtine ser xwe, bi taybetî Dokumentê Kopenhagê ya sala 1990 ya Konferansa li ser Dîmena Mirovî, Beşa IV, ku berpirsîyarîyên wan di heqê hûrgelên netewî de yek bi yek bi nav dike. Dîsa, tiştekî gelek mihîm ku divê neyê ji bîrkirin, hemû dewletên endamê RPHE bi berpirsîyarîyên Milletên Yekbûyî jî girêdayî ne di heqê mafên mirovî de, ku mafên hûrgelan jî di nav de ye; dîsa piranîya dewletên endamê RPHE tabîyê pîvanên (standardên) Konseya Ewrûpê ne.

KBHN, piştî xebateke baş ya çar salan, li gelek welatan ku lê mijûlbû, karibû hin pirs û nakokîyan nas bike ku bala wê kişandibûn û xwe dubare dikirin. Perwerdeya hûrgelan, bi taybetî perwerdeya zimanê hûrgelan di vî warî de gelek mihîm bû, ji ber ku, çawa KBHN jî dîyar dike, "Gelek eşkere ye ku perwerdegarî haletekî gelek giranbuha ye ji bo parastin û xurtkirina kesayetîya wan mirovan ku mensûbê hûrgelekî ne" Ji ber vê yekê, RPHN, di payîza 1995 de daxwaz kir ku Wakfa Pêvendî ya Nav-Etnîkî bi komeke pisporên gelek naskirî di warê navnetewî de bişêwire û guh bide pêşnîyarên wan ji bo heqên perwerdeyî yên hûrgelan di welatên RPHE de bi şiklekî minasiw bi cî bên.

Wakfa Pêvendî yên Grûbên Etnîk -ku rêxistineke sîwîl e û di 1993 de avabûye ji bo alîkarîya KBHN bike, di hin karên taybetî de- kesên pispor li ser babetên cuda cuda civandin û raya wan girt, ku ji van civînan du heb li Laheyê çêbûn. Yek ji wan civîna hiqûqnasan bû li ser

hiqûqa navnetewî, ya dinê jî civîna zimanzan û mamosteyên perwerdegarî bû ku li ser rewş û hewcedarîyên hûrgelan pispor bûn. Pisporên hanê di wan civînan de beşdar bûn:

> A.G. Boyd Robertson, Mamosteyê Sereke yê Zimanê Galî li Zankoya Strathclyde, Qeyzerîya Yekgirtû (United Kingdom); Dr. Pieter van Dijk, Endamê Şûrayê Dewletê (Holand); Dr. Asbjørn Eide, Midûrê Înstîtûya Mafên Mirovî ya Norwecê (Norwec); Professor Rein Müllerson, Mamosteyê Hiqûqa Navnetewî li Kings Kolejê (Qeyzerîya Yekgirtû); Professor Allan Rosas, Zankoya Akademî ya Åbo (Finlandê); Dr. Tove Skutnabb-Kangas, Doçend, Beşa Çand û Zimanan, Zankoya Roskilde (Danimark); Professor György Szépe, Beşa Îlmên Zimanan, Zankoya Janus Pannonius (Hungarî); Professor Patrick Thornberry, Beşa Hiqûqê, Zankoya Keele (Qeyzerîya Yekgirtû); Mr. Jenne van der Velde, Şêwirdarê Sereke ji bo Bernameya Perwerdegarî, Înstîtûya Netewî ji bo Pêşvebirina Bernameya Perwerdegarî (Holland).

Qasî ku pîvanên mafên hûrgelan yên heyî beşekî mafên mirovî ne, di van civînên şêwrê de pisporan berî her tiştî bala xwe dane ser pirsa hanê, gelo, dewlet çiqas berpirsîyarîya xwe bi cî bînin di warê mafên mirovî de bi awayekî giştî, bi taybetî jî, di warê azadîya ji neheqî û cudakarî? Di van civînan de her usa jî hat xuyakirin ku, armanca dawî ya hemû mafên mirovî, pêşvebirina kesayetîya mirov e bi şiklekî fireh û azad li ser esasê wekhevîyê. Di dawîyê de hat pêşnîyarkirin ku civaka sîwîl divê vekirî be, bi hereket û guhartin be, ango bikaribe herkesî nêzî hev bike, tevî kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne.

Pêşnîyarên dawî di heqê Mafên Perwerdeyî yên Hûrgelên Netewî de, hewl dide naveroka mafên perwerdeyî ya hûrgelan zelal bike, bi şiklekî giştî, ew çawa bi kar bên di çarçuveya ku KBHN pê mijûl dibe. Tevî wê jî, pîvan (standard) usa bên şirovekirin ku, ewê bikaribin di jîyanê de bi hemahengî bi kar bên. Pêşnîyar di bin heşt sernivîsên hûrik de dabeş dibin, ku her yek ji wan bi pirsekê re radibe, ku di pratîkê de derdikeve pêş.

## PÊŞNÎYARÊN LAHEYÊ
## Dİ HEQÊ MAFÊN MİROVÎ YÊN HÛRGELÊN NETEWÎ DE

### Ruhê hacetên navnetewî

1) Heqê parastina şexsîyeta xwe ji bo wan kesan ku mensûbê hûrgelekî netewî ne, bi şiklekî rastî û temam, tenê bi naskirin û hînbûna zimanê dayik bi şiklekî baş û bi rîya perwerdebûnê dibe. Her usa, kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, berpirsîyarîya wan jî heye ku, tevî civaka netewî ya fireh bin bi rîya naskirin û hînbûna zimanê dewletê.

2) Hemû dewlet, dema hukm û hacetên navnetewî bi kar tînin, ku dibe ew gor mafê hûrgelên netewî bin, divê tim gor esasên bingehîn yên wekhevîyê hereket bikin û tu car tefrîqê nekin.

3) Divê tu car ji bîr neçe ku, ev soz û peymanên navnetewî yên hanê, tenê pîvanên navnetewî yê herî kêm nîşan didin. Şirovekirina wan bi şiklekî teng dijî ruhê van soz û peymanan e.

### Gav û çavkanîyên aborî

4) Divê dewlet bi şiklekî çalak û alîkar bi mafên perwerdeyî yên hûrgelan mijûl bin. Li kîderê hewce be, divê dewlet ji bona bi cîanîna mafên perwerdeyî yên hûrgelan gavên taybetî bavêjin, bi aktîfî û bi hemû îmkanên xwe bixebitin, bi serê xwe û bi alîkarîya û hevkarîya navnetewî, bi taybetî di warê aborî û teknîkî de.

**Nemerkezîtî (ademî merkezîtî) û parvekirin**

5) Divê dewlet, şert û mercên baş çêbikin ji bo hûrgelên netewî de ku ew bikaribin sazîyan ava bikin, sazîyên hanê ku endamên wan temsîl bikin, her usa jî di warê hazirkirin û rêvebirina sîyaset û bernameyên perwerdeya hûrgelan de bi şiklekî baş pardar bin.

6) Divê dewlet di warê aborî de alîkarîya îdareyên herêmî û mehelî bikin bi şiklekî minasiw ji bo perwerdekırına hûrgelan, da ku bi vî awayî ew her usa jî bikaribin di pêvajoya çêkirina sîyaseta herêmî û mehelî de beşdar bin.

7) Divê dewlet gavan bavêje û tevdîran bistîne ji bo ku dê û bavan teşwîq bike, ku ew jî di çarçuva herêmî de bi sazîya perwerdegarî mijûl bin, çi dixwazin hilbijêrin, perwerdeyî bi zimanê hûrgelan jî di nav de.

**Sazîyên gelêrî û şexsî**

8) Gor hiqûqa navnetewî, wek hemû kesan, kesên ku endamê hûrgelên netewî ne jî xwedî heq in û dikarin sazîyên xwe yên taybetî yên perwerdeyî ava û îdare bikin bi hemahengî bi hiqûqa wî welatî re. Mektebên ku xwendinê bi zimanê hûrgelan dikin jî ji wan sazîyan in.

9) Dema ji bo kesên mensûbê hûrgelên netewî, heqê avakirin û îdarekirina sazîyên perwerdeyî hatibe dayîn, divê dewlet ji bo avakirin û îdarekirina wan sazîyan daxwazên bê mane neke, astengên yasayî û îdarî dernexe pêşîya vî heqî.

10) Sazîyên perwerdeyî yên şexsî bi zimanê hûrgelan, xwedî maf in ku di warê aborî de ji xwe re îmkanan peyda bikin; divê budça dewletê, çavkanîyên aborî yên navnetewî û sermîyanê şexsî ji wan re tu astengî dernexe û cudakarîyê neke.

**Perwerdeya hûrgelan di dibistana pêşîn û yên navçe de**

11) Di perwerdebûnê (xwendinê) de sala pêşîn ya herî esasî ye ji bo pêşveçûna zarokan. Gor lêkolînên li ser karê perwerdeyî, divê xwendin û hînbûna berî mektebê û ya li hêlîna zarokan (kîndergartinê) bi zimanê zarok be, eva ya herî baş e. Çiqas ji destê dewletê tê, divê îmkanan hazir bike da ku dê û bav jî ji vê yekê îstîfade bikin.

12) lêkolînên zanistî her usa jî nîşan didin ku, di dibistanên pêşîn de ya başlir ev e ku bernama perwerdeyî (ya dersan) bi zimanê hûrgelê be. Zimanê hûrgelê wek dersekî bê xwendin bi şiklekî rêkûpêk. Her usa, zimanê dewletê ya resmî jî divê wek dersekî bê xwendin, ger îmkan hebe bi destê mamosteyên ku herdu zimanan jî dizanin û di warê çand û zimanê zarokan de xwedî agahdarîyeke baş in. Ber bi dawîya vê pêvajoyê, divê bi rîya zimanê dewletê hin tiştên pratîk, ango ne nezerî jî bêne hînkirin. Çiqas ji destê dewletê tê, divê îmkanan hazir bike da ku dê û bav jî ji vê yekê îstîfade bikin.

13) Di mektebên navçe de beşekî mihîm yê xwendinê (bernameya dersan) divê bi rîya zimanê hûrgelan be. Zimanê Hûrgelan divê wek dersekî û bi şiklekî rêkûpêk bê hînkirin. Her usa, zimanê dewletê jî divê wek dersekî û bi şiklekî rêkûpêk bê hînkirin, ger îmkan hebe bi destê mamosteyên ku herdu zimanan jî dizanin û di heqê çand û zimanê zarokan de xwedî agahdarîyeke baş in. Di vê pêvajoyê de divê dersên bi zimanê dewletê derece derece bên zêdekirin. Berhemên lêkolînan nîşan didin ku ew zêdekirin çiqas hêdî be ji bo zarok ewqas baş e.

14) Rêvebirina perwerdegariyê bi zimanê hûrgel di mektebên pêşîn û navçe de, zêdetir tabîyê hebûna wan mamosteyan e ku di hemû warên zimanê dayik de hatine perwerdekirin. Bona vê yekê, ji ber ku hazirkirina firsendên baş ji bo perwerdegarîya zimanê hûrgelan wek bar û berpirsîyarîyek e li ser milê wan, divê dewlet îmkanên baş pêk bînin ji bo perwerdekirina mamosteyan, jê re rê-olaxan vekin û vî karî hêsantir bikin.

**Perwerdegarîya Hûrgelan di mektebên mesleg û hûneran de**

15) Divê li mektebên mesleg û huneran de jî firsenda perwerdegarîya bi zimanê hûrgelan hebe di hin dersên taybetî de, kîngê mensûbên hûrgela netewî daxwaz bikin, lazimîya wê bidin xuyakirin û hejmara wan jî têrê bike.

16) Bernameya dersê li wan mektebên mesleg û huneran ku di warê perwerdeyî de zimanê dayik bi kar tînin, divê usa bê tertîpkirin ku, dema ev bername bi kar hatin û gihan dawîyê, divê telebe bikaribin kar û hunera xwe bi herdu zimanan, ango him bi zimanê hûrgelê him jî bi zimanê dewletê bi kar bîne.

**Perwerdeya hûrgelan di dereca sêwem de**

17) Kesên ku mensûbê hûrgelan in, divê bikaribin xwendina dereca sêwem (xwendina bilind) jî bikin bi zimanê dayik, kîngê ew bixwazin û hewce bibînin û kîngê hejmara wan têrê bike. Perwerdegarîya bi zimanê hûrgelan di mektebên dereca sisêyan de divê bi rîya qanûnê vebe ji bo hûrgelên netewî. Bona vê yekê, tiştên ku hewce ye divê pêk bên, îmkan vebe di nava dezgeyê perwerdegarî de, da ku hewcedarîyên hûrgelên netewî di vî warî de bên cêbecêkirin. Mensûbên hûrgelên netewî bi xwe jî dikarin li rê-olaxan bigerin, hewl bidin ku sazîyên xwe yên perwerdeyî yên dereca bilind ava bikin.

18) Di vê dema dawî de, hûrgelên netewî li kîderê sazîyên xwe yên perwerdeyî yên bilind ava kirine û bi rêve birine, divê ew wek nimûne bêne naskirin ji bo hazirîyên pêşîyê.

**Pêşvebirina bernama perwerdegarîyê**

19) Ji ber giringî û qîmeta ku sazîyên navnetewî didine perwerdegarîya pirçandî û derxistina ronahîyê dîrok, çand û adetên hûrgelan, divê sazîyên dewletê yên perwerdekirinê çi lazime bikin, da ku di bernameya perwerdegarî de hînkirina dîrok, çand û adetên hûrgelên netewî jî cî bigrin. Teşwîqkirina endamên piranîyê ji bo hînbûna zimanê hûrgelên netewî ku di nav sînorê wê dewletê de dijîn, alîkarîya xurtkirina toleransê û pirçandiyê dike di wê dewletê de.

20) Naveroka bernameya perwerdegarî ya ku di heqê hûrgelan de ye, divê bê dewlemendkirin, bi beşdarîyeke aktîf ya wan kes û sazîyan ku temsîla hûrgelên hanê dikin.

21) Divê dewlet alîkarîyê bike ku navendên ji bo pêşvebirin û xurtkirina bernama perwerdegarîyê ya bi zimanên hûrgelan, bi rehetî ava bibin.

**NÎŞEYÊ RONKİRİNÊ**
**Jİ BO**
**PÊŞNÎYARÊN LAHEYÊ**
**Dİ HEQÊ MAFÊN PERWERDEYÎ YÊN HÛRGELÊN NETEWÎ DE**

**Agahdarîya giştî**

Daxuyanîya Cîhanî ya Mafên Mirovî ya 1948, di vî warî de bingehek danî, ji ber ku ew haceta navnetewî ya pêşîn bû ku perwerdegarî wek mafekî mirovî nîşan da.

Benda 26 ya vê Daxuyanîyê nîşan dide ku xwendina pêşîn îcbarî ye. Ew, ji bo dewletan wek berpirsîyarîyekê nîşan dide û ji wan dixwaze ku îmkan bidine her kesekî, ku ew ji xwendina teknîkî û pîşeyî îstîfade bikin, her usa jî rîya xwendina bilind ji wan re vekirî be, gor heslet û hunerên wan. Ew, her usa jî nîşan dide ku, divê armanca perwerdegarî pêşvebirina şexsîyeta mirovan be bi her awayî û xurtkirina hurmetê ji bo mafên mirovî û azadîyên bingehîn be. Benda 26 pê de diçe û dibêje, perwerdegarî di nava milletan, grûbên dînî û nijadî de hevdu fêmkirinê, toleransê (hurmeta hevdu) û hevaltîyê dê xurt bike û xizmeta parastina aşitîyê bike. Ew, her usa jî eşkere dike û dibêje, ji bo dê û bavan mafekî gelek bingehîn e ku ew bi xwe hilbijêrin, zarokê wan çi cure xwendinê bike. Şertên benda 26 di hiqûqa peymanê de li gelek cîyan bi xurtî têne ducarkirin, her usa jî di benda 13 ya Peymana Mafên Aborî, Civakî û Çandî de bi firehî cî digrin.

Benda 26 di vê pirsê de rêçeke bi her awayî zelal datîne pêş ji bo hacetên navnetewî yên dinê, ku piştre derketin holê û mafê perwerdeyî xurttir kirin, pê hûr hûr mijûl bûn, him bi şiklekî giştî him jî bi alîyê hûrgelan bi taybetî.

- Benda 27 ya Peymana Navnetewî ya Mafên Medenî û Sîyasî.
- Benda 30 ya Peymana Mafên Zarokan.

Ev bendên jorê mafê Hûrgelan garantî dikin, ku ew dikarin zimanê xwe di civakê de tevî hemû endamên wê civakê bi kar bînin. Ev bendên jêrê jî, di alî xwe de, garantî didine hûrgelên netewî ku ew dikarin zimanê xwe hîn bin û di zimanê xwe de bixwînin.

- Benda 5 ya Peymana UNESCO Dijî Cudakarîyê di warê Perwerdegarî de.
- Paragrafa 34 ya Dokumentê Civîna Kopenhagê ya Konferansa li ser Dîmena Mirovî ya KPHE (Konferansa Parastin û Hevkarîyê ya Ewrûpê).
- Benda 4 ya Daxuyanîya MY (Milletên Yekbûyî) li ser Mafên Kesan ku Endamê Hûrgelên Etnîkî, Dînî û Zimanî ne.
- Benda 14 ya Peymana Bingehîn ji bo Parastina Hûrgelên Netewî.

Ev hemû peyman û hacetên navnetewî mafê hûrgelên netewî nîşan didin, dibêjin heqê wan e ku nasnama xwe ya komekî (kollektîfî) biparêzin bi rîya zimanê xwe yê dayik. Ew heq berî her tiştî bi rîya perwerdegarî, ango bi rîya xwendinê dibe. Li alîyê din, ew hacetên hanê nîşan didin ku, tevî parastina nasnameya kollektîfî ya hûrgelên netewî bi rîya zimanê dayik, berpirsîyarîya wan jî heye ku tevî civaka netewî ya fireh bin û tê de beşdar bin. Ev tevlêbûn (entegrasyon) zanîneke baş dixwaze di warê herdu zimanan de jî, ango him ya civaka hûrgelê, him jî ya Dewletê. Pêşvebirina hurmeta hevdu (tolerans) û pirrengî jî beşeke girîng e di vê guhartinê de.

Hacet û peymanên navnetewî ku behsa mafê perwerdeyî bi zimanê hûrgelan dikin, bi awayekî giştî li ser vê pirsê disekinin. Ew yek bi yek bi rêz nakin ku perwerdegarî bi zimanê dayik ji bo hûrgelan bi kîjan rê û olaxan û di kîjan sewîyê de wê pêk bê. Gotinên wek "firsendên minasiw" ji bo hînbûna zimanê hûrgelan yan jî xwendin û perwerdegarî di zimanê wan de, çawa di benda 14 ya Peymana Bingehîn ya Konseya Ewrûpê ji bo Parastina Hûrgelên Netewî de hatîye gotin, divê tevî anasirên dinê li ber çavan bê girtin. Di vê çarçuvê de, divê tevdîrên baş bêne stendin ji bo parastin, xurtkirin û pêşvebirina ziman û çand, çawa di benda 5 ya Peymana hanê (ya Konseya Ewrûpê) de hatîye nîşandan, her usa jî, divê çi lazim e bê kirin ji bo parastina nasnameya etnîkî, çandî, zimanî û dînî ya hûrgelên netewî, çawa di paragrafa 33

ya Dokumentê Civîna Kopenhagê ya Konferansa li ser Dîmena Mirovî ya KPHE de hatîye nîşandan.

Divê ev tişt li dervayî rê-olaxên ku dewletan nîşan dane, ango bi şiklekî kêyfî pêk neyên. Ji dewletan tê xwestin ku bala xwe bidine daxwaz û hewcedarîyên hûrgelên netewî û çi lazim e bikin, dema civakên hanê (hûrgel) daxwazên xwe tim nîşandin.

Hûrgelên netewî jî divê nîşandin ku daxwazên wan li cî ne. Divê ew jî faktorên meşrû bidine ber çavan, wek hejmara wan, nifûsa wan li herêma (yan jî herêmên) hanê, her usa jî hêz û îmkanên wan têrê bike ji bo alîkarîya berdewamîya van xizmetan.

**Ruhê Hacetên Navnetewî**

Bi derbazbûna waxt û zeman, di uslûbê mafên hûrgelan de, ango şiklê cîgirtina wan di pîvanên (standardên) navnetewî de jî guhertin çêbûye. Wek şiklê han ê pasîf: "...Kesên ku mensûbê hûrgelan in, devê bêpar nemînin ji mafên..." çawa di Peymana Navnetewî ya Mafên Medenî û Sîyasî (1966) de hatîye gotin. Yan jî bi şiklekî gelek misbet, xurt û aktîf: "...Dewlet nasnameya etnîkî, çandî, zimanî û dînî ya hûrgelên netewî dê biparêze..." çawa di Dokumentê Civîna Kopenhagê ya Konferansa li ser Dîmena Mirovî (KPHE) de cî girtîye. Ev guhartina ber bi pêş jî nîşan dide ku şirovekirina van hukm û hacetan bi şiklekî teng û kêm ne gor ruh û sebebê hebûna wan e.

Digel vê jî, di vî warî de rê-olaxên ku bêne vekirin, divê gor esasên bingehîn yê wekhevî û necudakarî bin, çawa di benda 1 ya Peymana Milletên Yekbûyî de û di benda 2 ya Daxuyanîya Cîhanî ya Mafên Mirovî de hatîye nîşankirin, her usa jî di gelek peymanên navnetewî de hatîye dubarekirin. Her usa jî divê rewşên taybetî yên her dewletekî li ber çavan bê girtin.

**Gav û çavkanîyên aborî**

Dewletên RPHE têne teşvîqkirin ku pirsa mafên hûrgelan bi şiklekî aktîf mijûl bin, ango gor rûhê benda 31 ya Dokumentê Kopenhagê ku wan teşwîq dike, gavên taybetî bavêjin bona bi cîanîna wekhevîyeke temam ji bo endamên hûrgelên netewî. Her usa, benda 33 ya Dokumentê Kopenhagê jî ji dewletan dixwaze ku nasnameya etnîkî, çandî, zimanî û dînî ya hûrgelên netewî -yên ku di nav sînorên wan de dijîn- biparêze û ji bo pêşvebirina vê nasnamê tevdîran bistîne.

Carina li dewletên RPHE di warê diravî de tengasîyên mezin çêdibin ku bi şiklekî yasayî dikarin bibin asteng li pêş rêvebirina sîyaset û bernameyên perwerdegarîyê ku bi kêrî hûrgelên netewî tên. Herçiqas hin maf divê di zûtirîn zeman de bi cî bên, divê dewlet hewl bidin ku, bikaribin vê xizmetê her pêşva bibin, ji bona bi cîanîna mafên perwerdeyî ya hûrgelan bi şiklekî temam, îmkanên xwe heya dawîyê bi kar bînin, heya ji bona vê yekê li alîkarî û hevkarîya navnetewî bigerin gor ruhê benda 2 ya Peymana Navnetewî ji bo Mafên Aborî, Civakî û Çandî.

**Nemerkezîtî (ademî merkezîtî) û parvekirin**

Benda 15 ya Peymana Bingehîn ji bo Parastina Hûrgelên Netewî, paragraf 30 ya Dokumentê Civîna Kopenhagê ya Konferansa lı ser Dîmenê Mirovî ya KPHE û benda 3 ya Daxuyanîya MY ku di heqê Mafên wan Mirovên ku Mensûbê Hûrgelên Netewî, Etnîk, Dînî û Zimanî ne,

hemû jî beyan dikin û dibêjin, hewce ye ku hûrgelên netewî di pêvajoyên biryargirtinê de beşdar bin, bi taybetî di hal û rewşên hanê de ku dikare tesîra xwe rasterast li wan bike.

Beşdarîyeke xurt di pêvajoya biryargirtinê de, bi taybetî dema ew tesîra xwe li hûrgelan dike, ji bo pêvajoya demokrasîyê şertekî mihîm e.

Paragrafa 35 ya Dokumentê Kopenhagê dibêje, beşdarîya endamên hûrgelên netewî di karên civakî de –digel kar û barên ji bo parastin û pêşvebirina nasnama wan - bi şiklekî xurt gelek mihîm e. Bona vê yekê, divê dewlet di pêvajoya perwerdegarî de (digel pêvajoya pêşvebirina bernameyên perwerdegarîyê, qasî ku hûrgelan eleqeder dike) têkilîya dê û bavan di dereca navçe û herêman de, her usa jî beşdarîya sazîyên ku temsîla hûrgelên netewî dikin, bi şiklekî xurt hêsantir bikin.

**Sazîyên gelêrî û şexsî**

Benda 27 ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî, nîşan dide ku heqê hûrgelan e ku zimenê xwe di civakê de bi kar bînin tevî endamên dinê yê grûba xwe. Benda 13 ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Aborî, Civakî û Çandî, mafê dê û bavan garantî dike û dibêje, heqê wan heye ku biryar bidin zarokê wan biçe kîjan mektebê û ewê bikaribin hilbijêrin mektebên dervayî yê dewletê. Ev bend her usa jî garantî dike ku heqê kesan û sazîyan heye ku bikaribin sazîyên perwerdegarîyê yên alternatîf ava û îdare bikin, bes ew, qe nebe, gor pîvanên perwerdegarîyê yên kêmtirîn (mînîmûm) bin ku bi alîyê dewletê hatine danîn. Benda 13 ya Peymana Bingehîn ji bo Parastina Hûrgelên Netewî behsa mafê hûrgelan ya avakirin û rêvebirina sazîyên xwe yên perwerdegarîyê dike, herçiqas dewlet ne mecbûr e mesrefê van sazîyan bigre ser xwe. Paragrafa 32 ya Dokumentê Kopenhagê dewletê îcbar nake ku mesrefê van sazîyan bide, lê ew şertan datîne ku sazîyên hanê bikaribin “alîkarîyê ji dewletê bixwazin gor yasayên netewî.”

Heqê hûrgelên netewî ji bo avakirin û rêvebirina sazîyên xwe yên taybetî, yên perwerdeyî jî di nav de, di hiqûqa navnetewî de baş cîyê xwe girtîye û divê bi vî şiklî bê naskirin. Herçiqas heqê dewletê heye ku çavê xwe li ser vê pêvajoyê be bi alîyê îdarî û hertişt gor qanûnan bimeşe, lê divê, bi daxwazên îdarî yên ne li cî û ne makûl, di pratîkê de pêşî li vî heqî negre, ango nebe asteng ku hûrgelên netewî bikaribin sazîyên xwe yên perwerdeyi ava bikin.

Herçiqas dewlet bi şiklekî resmî ne mecbûr in mesrefê van sazîyan bigrin ser xwe, lê divê nebin asteng jî, ango ew sazî bikaribin li nav welat û der welat li çavkanîyên diravî bigerin.

**Perwerdeya hûrgelan di dibistana pêşîn û yên navçe de**

Hacet û peymanên navnetewî yên ku bi perwerdeya zimanê hûrgelan mijûl dibin, beyan dikin ku hûrgel ne tenê xwedî parastina nasnama xwe ne bi rîya karanîna zimanê xwe, lê her usa jî heqê wan heye ku beşdarî civaka netewî ya fireh bin û bibin parçeyek wê bi rîya hînbûna zimanê dewletê.

Gor vê raya jorê, pirzimanî ji bo hûrgelên netewî yên dewletên RPHE dikare bibe rê û haleteke pir xurt ji bo gihîştina armancên sazîyên netewî di warê parastina hûrgelên netewî de, her usa jî bo entegrasyona wan. Pêşnîyarên di heqê mektebên pêşîn û navçe usa hatine hesibandin ku rê vekin ji bo pêşveçûna sîyaseta perwerdegarî bi zimanê hûrgelan û alîkarîya hazirîya bernameyên xwendinê bikin.

Ev metodê hanê pêşnîyara lêkolînên perwerdeyî ye û şiroveyeke makûl e ji bo normên navnetewî.

Berhemdarîya vê metodê tabîyê gelek faktoran e. Yek jê ew e, ev metod zimanê dayik ya hûrgelê ku sist e heya çi derecê xurt dike bi karanîna wî zimanî di warê xwendinê de. Faktora dinê, di temamîya vê pêvajoyê de mamosteyên bi du ziman heya çi derecê têne karanîn.

Dîsa faktoreke din ku divê li ber çav bê girtin ev e: herdu ziman, ango yê hûrgelê û yê dewletê heya çi derecê hatîne xwendin di 12 salên mektebê de. Ya dawî jî, herdu ziman heya çi derecê hatine karanîn ji bo perwerdekirina zarok di qonaxên cuda cuda de.

Ev metod hewl dide ku firsendan çêbike ji bo xurtkirina zimanê hûrgelê yê sist. Lê rayeke din jî heye ku vê metodê mahkûm dike, ewê ku dixwaze xwendina bi zimanê hûrgelê ji bo derbazbûna xwendina zimanê dewletê kar bîne di demeke kurt de, her usa jî çiqas jê bê, xwendina zimanê hûrgelê ewqas kêm bi kar bîne.

Hin metod jî hene ku di mektebê de dersan bi tevayî bi zimanê dewletê didin û zarokên hûrgelan dikin sinifên zarokên piranîyê, bi vî awayî dixwazin zimanê hûrgelan bi tevayî windakin, eva ne gor pîvanên navnetewî ye. Çawa ku hin caran jî di hin mektebên cudakirî de ders bi giranî bi zimanê hûrgelê bêne xwendin di temamîya pêvajoya perwerdeyî de û zimanê dewletê yan qet neyê xwendin, yan jî bi şiklekî gelek kêm.

**Perwerdeya Hûrgelan di mektebên mesleg û huneran de**

Ev heqê mensûbên hûrgelên netewî, ango hînbûna zimanê dayik, yan jî xwedin bi zimanê dayik, çawa di paragrafa 34 ya Dokumentê Kopenhagê de hatîye beyankirin, her usa di mektebên mesleg û hûneran de jî derbaz dibe, di hin xwendinên taybetî de. Dewletên RPHE divê ji bona vê yekê jî rê û olaxan hazir bikin li kîderê ew daxwaz bê kirin û hejmar jî têrê bike.

Li alîyê dinê jî, divê îmkanên dewletê yên heyî ji bo plankirin û qontrolkirina sîyasetên aborî û perwerdeyî neyê kêmkirin. Ew kesên ku wan mektebên kar û huneran -yên ku bi zimanê dayik dersê didin- xilas dikin, dema bikaribin zimanê dewletê jî baş bi kar bînin, ew ji bo wan awantajek e. Ew bi vî awayî dikarin him li wê herêmê bixebitin ku xelkê hûrgelê bi giranî lê dijî, him jî li her cîyê dinê di nav sînorên wê dewletê de. Di demeke han de ku welat derbazî bazara serbest dibe û hewl dide çûn-hatina mal, xizmet û kar-xebat bi her awayî serbest e; qeyd û şertên hanê ku vê hereketê teng dikin, karê dewletê zehmettir dikin di warê avakirina firsendan ji bo kar û xebatê û ji bo û pêşvebirina aborîya welat. Bona vê yekê, perwerdeya hûrgelên netewî bi zimanê dayik li mektebên mesleg û huneran, divê her usa jî îmkanê bide xwendekarên hanê ku ew bikaribin di warê zimanê dewletê de jî bi şiklekî minasiw perwerde bin.

**Perwerdeya hûrgelan di dereca sêwem de**

Çawa di beşa jorê de jî hatibû gotin, mafê hînbûna zimanê dayik, yan jî mafê perwerdebûnê bi zimanê dayik, çawa di paragrafa 34´an ya Dokumentê Kopenhagê de hatîye gotin, her usa, mafê perwerde yê xwendina dereca sêwem (xwendina bilind) jî nîşan dide bi zimanê dayik ji bo hûrgelên netewî. Di rewşeke han de careke din, esasên wekhevîya firsendan û ya necudakarîyê divê li ber çavan bê girtin, her usa jî hewcedarîyên civakê û helbet hejmareke makûl. Dema dewlet mesrefê van sazîyan negre ser xwe jî, divê hûrgel di avakirina sazîyên xwe yên bilind de azad bin û dewlet tu astengî dernexe pêşîya wan.

Paragrafa 33 ya Dokumentê Kopenhagê ehemmîyeta vê yekê nîşan dide û dibêje, berpirsîyarîya dewletê ne tenê parastina nasnameya hûrgelan e, her usa jî pêşvebirina wê ye. Gor vê bîr û rayê, divê dewlet, li ser vê meselê bifikirin, îmkanan hazir bikin ji bo perwerdeya dereca sêwem bi zimanê dayik, li kîderê ev daxwaz hebe û hejmarê hûrgelê jî têrê bike. Di vê çarçuvê de, divê xwendina bilind bi zimanê dayik serbest be ji bo perwerdeya mamosteyan jî.

Di pêkhatina vî karî de, divê tengasîyên malî yên dewletan, bi taybetî yên ku teze derbazî bazara serbest dibin, li ber çavan bê girtin. Hazirîya xwendina derece sisêyan di zimanê hûrgelê de, ne eynî tişt e bi avahîyên binî di eynî demê de. Serda jî, cudakirina sazîyên perwerdeyî yên paralel di dereca ûnîversîtê de, dikare hûrgelê îzole bike ji piranîyê. Benda 26 ya Daxuyanîya Cîhanî ya Mafên Mirovî beyan dike ku armanca perwerdegarîyê pêşvebirina fêmkirina hevdu, tolerans û hevaltî ye di navbera milletan, nijadan û grûbên dînî de. Divê ev yek, her usa jî mesela entegrasyonê ji bîran neçe, û pêşveçûna rewşenbîrî û çandî ya herdu alîyan, ango him ya piranîyan him jî ya hûrgelan ji hev îzole nebe.

**Pêşvebirina bernama perwerdegarîyê**

Ji Şerê Cîhanê yê Duwem vir de hejmara sazîyên navnetewî ku li ser giranîya perwerdegarîyê sekinîn her ku çû zêde bû. Gor van sazîyan tişkê ku ji perwerdegarîyê tê xwestin ne tenê xwendineke di warê akademîkî û teknîkî, lê her usa jî, divê bi rîya wê bîr û bawerîyên di warê toleransê, pirdengî û pirrengîyê, dijî nijadperestîyê û hemahengîya navnetewî û ya nava civakan jî bêne xurtkirin. Ew hewcedarîyên hanê, kar û barekî taybetî dikin ser milê dewletan ku bi taybetî di nava sînorên wan de hûrgelên netewî hene. Di van dewletan de, pirsa hevrajîyanê û hemahengîyê di navbera grûbên etnîk yên cuda de, her usa jî bo aramîya wan dewletan di hundur xwe de gelek mihîm e. Ev hevrajîyan û hemahengî, her usa jî, ji bo parastina aşitî û aramîyê di wê herêmê de gelek hewce ye.

Benda 4. ya Daxuyanîya MY li ser Mafên wan Kesan ku Mensûbê Hûrgelên Netewî, yan jî Etnîk, Dînî û Zimanî ne, ji dewletan dixwaze ku "zanîna di heqê dîrok, adet û tore, ziman û çanda hûrgelên heyî di nav sînorên wan de xurt bike." Benda 12 ya Peymana Bingehîn ji bo Parastina Hûrgelên Netewî jî ji dewletan dixwaze ku "zanîna di warê çand, dîrok, ziman û dînê hûrgelên xwe yên netewî de xurt bikin."

Paragraf 34 ya Dokumentê Civîna Kopenhagê ya Konferansa li ser Dîmena Mirovî ya KPHE, hewcedarîya hanê beyan dike û dibêje, di bernama perwerdegarîyê ya mekteban de, divê dewlet "her usa jî dîrok û çanda hûrgelên netewî li ber çavan bigrin."

Ev daxwaz baş nîşan didin ku dewlet mecbûr in, di bernama perwerdegarî ya mekteban de cî bidin xwendina dîrok û toreyên hûrgelên netewî ku di nav sînorên wan de dijîn. Divê dewlet vî karî rasterast bi destê sazîyên xwe pêk bîne û li benda daxwaz û beşdarîya hûrgelên hanê nesekine. Ji ber ku helwesteke han ne li cî ye û xizmeta armancê nake.

Benda 15 ya Peymana Bingehîn ji bo Parastina Hûrgelên Netewî, paragrafa 30 ya Dokumentê Cıvîna Kopenhagê ya Konferansa lı ser Dîmena Mirovî ya KPHE û benda 3 ya Daxuyanîya Milletên Yekbûyî li ser Mafên wan Kesan ku Mensubê Hûrgelên Netewî, yan jî Etnîk, Dînî û Zimanî ne, hemû jî behsa ehemmîyeta beşdarîya hûrgelên netewî dikin di pêvajoya biryargirtinê de, bi taybetî kîngê babeta biryara hanê tesîra xwe li ser wan dike.

Bona vê yekê, avakirina navendan ji bo pêşvebirina bernama perwerdeyî di zimanê hûrgelan de, van herdu pêvajoyan hêsantir dike û dereca profesyonelîyê dide wan.

**Gotinên dawî**

Pirsa mafê perwerdeyî ya hûrgelan, babeteke gelek hessas e li gelek dewletên ku endamê RPHE ne. Her usa jî, pêvajoya perwerdeyî xudanê potensîyela hanê ye ku dikare hurmeta hevdu û fêmkirina ji halê hevdu xurt bike di navbera gelek civakan de li van dewletan.

Bi alîyekê ku ev babetekî gelek hessas e di roja îro de û bi alîyê din, pîvanên ku bi destê gelek sazîyên navnetewî di warê mafên mirovî de hatine danîn bi awayekî ne ewqas zelal in, armanca ji wan pêşnîyarên ku li ser hûr hûr hatine xebitîn, hêsankirin û zelalkirina vê pirsê ye di warê mafên hûrgelan da. Pêşnîyarên Laheyê ne pir fireh in. Ew wek çarçuve hatine danîn ku alîkarîya dewletan bikin di pêvajoya pêşvebirina sîyaseta perwerdeyî ya hûrgelan de.